Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

TURVAPAIKKA-,
MAAHANMUUTTO- JA
KOTOUTTAMISRAHASTO

Euroopan unionin tuella

# Agahî bo penaxwazan


## Zarokên bê bêbab hatine

## TU JI WELATÊ XWE REVIYAYÎ Û TE DAXWAZA PARASTINÊ JI FÎNLANDAYÊ KIRIYE

**Te gotiye ku tu ji 18 salan biçûktir î. Li gor qanûna Fînlanda kesên ji 18 salan biçûktir zarok in. Wan mafên taybet bo parastin û xwedîkirinê hene. Hemû zarok li Fînlanda xwedî heman mafan in, bo nimûne mafê çûna xwandingehê û çarekirina nexweşiyan.**

Tu bêyî dêbab hatî Fînlanda. Lê tu ne bi tenê yî, gelek mezin dê alîkariya te bikin. Karmendên navenda penaxwazan dê alîkariya xwedîkirin û mezinkirina te bikin. Herwiha nûnerek dê bêt alîkariya te ku dê karûbarên te li gel karbidestan bimeşîne.

Di vê belavokê de em ê behsa çawaniya birêvçûna proseya penaxwaziyê bikin. Herwiha dikarî dawa agahiyên zêdetir ji karmendên navenda penaxwaziyê yan ji nûnerê xwe bikî.



### PARASTINA SURAN ERKEKÎ SER MILÊ KARBIDESTAN E

- Li Fînlandayê dikarî bawerî bi karbidestan bînî, wek polîsan, karkerên Dezgeha Sinor û Daîreya Koçberan Ew şarezayên karê xwe û li gor qanûnan dixebitin.
- Hemû birêveberên meseleya te pêbendî parastina suran in. Anku nabe ew tiştên di karê xwe de bihîstî bo kesên derve bibêjin. Erkê parastina suran herwiha li ser karmendên kampê, tercumanan û parêzeran jî heye.





**Proseya penaxwaziyê wiha dimeşe**

## 1. Bo karbidestên sinor yan polîsan bibêje ku tu dawa penaberiyê dikî.

Tu dikarî dawa penaberiyê ji Fînlandayê bikî tenê bi hazirbûna li Fînlandayê Gava tu tê Fînlandayê, bibêje karbidestên sinor an polîsan ku tu penaberiyê dixwazî. Karbidest dê te wek penaxwaz qeyd bikin, agahiyên te li ser tomara biyaniyan binivîsin, şopa tiliyên te (tenê kesên ji 6 salan mezintir), îmzaya te û wêneyên te bigirin Eger te pasport an nasnameyeke din hebe, wê nîşanî karbidestan bide.

Bizane ku dayîna agahiyên şaş yên nasnameyê li Fînlandayê tawan e. Kesên ji 15 salan mezintir ji ber tawanan berpirsiyar in.

- Dema meşandina dawaya xwe mafê te heye li Fînlanda bimînî.
- Malbatiyên te dikarin dawa îqameyê ji Fînlanda bikin tenê piştî ku te îqame wergirtibe.










## 2. Karbidest dê te bişînin navenda penaxwazan

Dikarî dema meşandina dawaya xwe li navenda penaxwazan bijî Li wê derê hinek zarokên din jî dijîn ku dêbabên wan ne li Fînlanda ne. Li navenda penaxwazan tu biewle yî. Li wê derê herdem karmend hene ku dikarî li gel biaxivî û jê dawa alîkariyê bikî.

Karmendên navenda penaxwazan ji xwedîkirin, mezinkirin û çavdêriya te ya rojane berpirsiyar in. Dikarî biçî xwandingehê û beşdarî gelek mijûlahiyan bibî.

Divê ku tu guhdarî qeyd û bendên navenda penaxwazan û tiştên lihevkirî bî. Eger te pirsgirêk li gel zarokên din hebin, behsa wan li gel karmendan bike. Herdem bibêje karmendên navenda penaxwazan ku tu li kû derê yî û bersiva telefonê bide gava ku navenda penaxwazan bo te dike.

Navenda penaxwazan nikare tesîrê li ser meşandina dawanameya penaxwaziyê bike.




### 3. Dadgeh bo te nûnerekî diyar dike.

Kesên biçûktir ji 18 salan li gor qanûnê zarok in û nikarin bi tenê karûbarên xwe li gel karbidestan li Fînlanda bimeşînin. Loma dadgeh dê bo te nûnerekî diyar bike. Ew mezinek e ku di proseya penaxwaziyê û karûbarên din yên li gel karbidestan de alîkariya te dike. Karê wî ew e ku berjewendiya te di hemû rewşan de biparêze.


**NÛNER ÇI DIKE?**

- Nûner reya te li ser meseleyên cuda dipirse û piştrast dike ku karbidest guhdariya reya te bikin.
- Nûner dê agahiyên derbarê maf û erkên te di proseya penaxwaziyê de bide te.
- Nûner dê li gel te gava ku tu hevdîtinan li gel karbidestan dikî, bo nimûne li Daîreya Koçberan û polîsan. Ew herwiha li ser navê te têkiliyê li gel karbidestan datîne.
- Nûner dê reya xwe bo te bibêje ka çi di berjewendiya te de ye di her rewşekê de.
- Nûner dê bo te parêzerekî peyda bike eger hewce be û dê têkiliyê li gel wî deyne.
- Nûner kaxezên giring li gel te îmza dike.

**NÛNER ÇI NAKE:**

- Nûner ne berpirsiyar e ji xwedîkirin û mezinkirina te ya rojane. Ew karê navenda penaxwazan e. Nûner herwiha destwerdanê yan tedaxulê di rêkar û bendên navenda penaxwazan de nake.
- Nûner pareyan bi deyn nade te û tiştan bo te nakire.
- Nûner nikare te bigire mala xwe daku li wê derê bijî.





### 4. Daîreya Koçberan lêkolînê dike ka dawa te li Fînlandayê bimeşe.

Heta eger te dawa ji Fînlanda kiribe jî, belkî dawa te li welatekî din bimeşe.

Welatên Yekîtiya Ewropayê û Norwec, Îzlanda, Swîsre û Liechtenstein pêbendî peymana Dublînê ne. Li gor wê dawa penaberiyê tenê li yek ji wan welatan tê meşandin. Bibêje karbidestan eger:

- malbatî yan mirovên te li welatekî din yê Dublînê hebin
- te îqame yan vîzeya welatekî din yê Dublînê hebe
- pêştir tu li welatekî din yê Dublînê bûbî
- şopa tiliyên te li welatekî din yê Dublînê hatibin qeydkirin
- eger te dawa penaberiyê li welatekî din yê Dublînê kiribe.

Eger te malî yan mirovên xwe li welatekî din yên Dublînê hebin, hewl tê dan ku te û wan li Fînlandayê yan li welatekî din bigihînin hev. Dawaya te ya penaberiyê dê paşî li wî welatî bimeşe. Eger te malbatî yan mirov li welatekî din yê Dublînê tine bin, dawaya te dê li Fînlanda bimeşe.

Dawaya te herwiha belkî neyê lêkolîn eger:

- jixwe welatekî biewle parastin dabe te
- tu ji welatekî biewle hatî Fînlandayê ku li wê derê dikarin te biparêzin.



## 5. Di lêpirsînê de tê ronkirin tu çima dawa penaberiyê dikî.

Lêpirsîna penaxwaziyê hevîdtineke gelek giring e. Nûnerê te dê alîkariya te bike bo xwehazirkirinê. Daîreya Koçberan dê te gazî bike lêpirsînê. Tu û nûnerê xwe gazînameyê û pêvekên li gel wê baş bixwîne. Navenda penaxwazan dê bi tirimpêlê bigihîne lêpirsînê.

Nûnerê te jî dê di lêpirsînê de hazir be. Parêzerê te dikare di lêpirsînê de hazir bibe eger bi nêrîna wî hewce be.

Di lêpirsînê de tê ronkirin ka tu kî yî û çawa hatî Fînlandayê. Navê malbatiyên xwe bi hûrgilî û rast bibêje. Dayîna agahiyên şaş paşî anîna malbatiyên te bo Fînlandayê dijwar dike.

Ji te dipirsin tu çima ji welatê xwe reviyayî û çima nikarî vegerî wê derê. Hemû belgename û şehadeyên ku gotinên te isbat dikin xwe li gel xwe bîne.

Bi cesaret behsa hemû wan tiştan bike ku belkî tesîr li ser dawaya te ya penaberiyê bikin. Herwiha eger tiştekî nizanî bibêje ku nizanî. Bibêje eger ji tercumanî yan ji pirsan fehm nekî.

Muhim e ku hemû sebebên xwe yên penaxwaziyê di cih de bibêjî. Eger tu paşî hinek sebebên din bibêjî, divê ku te sebebek qebûlkirî hebe bo hindê ku te pêştir ew sebeb negotibûn. Sebeb divê wisa be ku te bi xwe ti tesîr li ser nebûne.

Di lêpirsînê de bîrnameyek tê nivîsîn û kopiyek ji wê didin te (eger tu ji 15 salî mezintir bî) û nûnera/ê te.







### DEMA MEŞANDINÊ

- Meşandina dawaya penaberiyê dikare heta 6 mehan vekêşe. Bi rehetî li hêviya biryarê be.
- Eger nikarin di wê demê de biryarê li ser dawata te bidin, Daîreya Koçberan dê te haydar bike û texmîneke nû derbarê kengî hatina biryarê bide te.
- Dikarî herwiha ji ser malpera Daîreya Koçberan dema meşandinê bihejmêrî.

### RONKIRINÊN ZÊDETIR

- Dikarî piştî lêpirsînê ronkirinên zêdetir bigihînî Daîreya Koçberan. Dikarî ronkirinên zêdetir bigihînî bo nimûne eger rewşa te ji ber qewimînên nû li welatê te gelek guherîbe yan te tiştekî giring di lêpirsîna xwe de ji bîr kiribe.
- Li gel nûnerê xwe li ser meselê biaxive. Eger hewce be, ew dê ronkirinên zêdetir bigihîne Daîreya Koçberan.

## 6. Biryarek li ser dawaya te tê.



Piştî lêpirsînê Daîreya Koçberan lêkolînê li ser dawaya te dike. Eger hewce be, dikarin agahiyên zêdetir ji nûnerê te bixwazin. Gava ku biryar li ser dawaya te da, dê biryareke nivîsî bo te bêt.

Biryara te hatiye dan li ser qanûna biyaniyan, li ser agahiyên te di lêpirsînê de dayî, li ser belgeyên din yên pêşkêşkirî û agahiyên ku Daîreya Koçberan derbarê rewşa welatê te de hene.

Biryara te belkî erênî yan neyînî be. Polîs an Daîreya Koçberan dê biryarê bigihîne te û nûnerê te. Biryarê li gel nûnerê xwe bixwîne.

### BIRYARA ERÊNÎ



Dê îqameyê bidin te anku tu dikarî li Fînlanda bimînî. Dê te bi otomatîkî li ser sîstema nifûsê ya Fînlandayê qeyd bikin û hejmareke şexsî bidin te.

Îqame dikare ji ber sebebên cuda bêt dayîn.
Sebeb ev in:

1) penaberî

2) parastina duyemînî

3) sebebên mirovî yê şexsî

4) tinebûna imkanên derxistina ji welatî

5) qurbaniya bazirganiya bi mirovan.

Sebebê îqameya te li ser biryara te hatiye nivîsîn. Agahiyên zêdetir derbarê îqameyê dikarî ji vîdyo û malperên Daîreya Koçberan bibînî.

Eger bi biryara xwe nerazî bî, dikarin itiraz bikî li dadgeha îdarî. Bo nivîsîna itirazê tu hewceyî parêzerekê yî.

### KARTA ÎQAMEYÊ

Li gel biryarê karta îqameyê jî didin te. Ew isbat dike ku te maf heye li Fînlandayê bimînî. Dema karpêkirina kartê jî bi qasî ya îqameyê ye.

### KARTA NASNAMEYÊ

Tu hewceyî belgeya nasnameyê yî bo nimûne daku hesaba bankê vekî. Belgeya nasnameyê dikare pasporta welatê te be yan karta nasnameyê ya fînlandî be. Dikarî dawaya karta nasnameyê ji polîsan bikî.

### BELGEYA SEFERKIRINÊ

Li gor qanûnê divê te belgeyeke seferkirinê ya demneborî hebe. Eger penaberiyê bidin te, dikarî dawa belgeya seferkirinê ya penaberan bikî. Eger parastina duyemînî yan îqameyeke din wergirî, dikarî dawa pasporta biyaniyan bikî. Bi wan belgeyan dikarî sefer bikî derveyî welat û vegerî Fînlanda.

### NEQILBÛNA BAJARÎ

Gava ku îqameyê wergirî, dikarî ji navenda penaxwazan neqil bibî bajarekî maleke komî ya malbatî. Tu dê li wê derê bijî heta bibî 18 salî. Karmendên mala komî ya malbatî dê te rojane xwedî bikin û çavdêriya te bikin. Nûnerê te dê her bimîne û alîkariya te di karûbarên hikûmî de bike heta bibî 18 salî.

Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service



## BIRYARA NEYÎNÎ

Îqameyê nadin te û tu nikarî li Fînlanda bimînî.

Li gel biryara neyînî Daîreya Koçberan herwiha biryarê dide ku divê tu ji vî welatî derkevî.

Dikarin herwiha vegerînê li te qedexe bikin. Anku tu nikarî vegerî Fînlanda yan herêma Schengen. Qedexe dikare bo demekî diyarkirî yan bo heta biryareke din be.

### MEŞANDINA LEZANDÎ

Eger welatê te biewle be û bikarî vegerî wê derê, dawaya te bi zelalî bêbingeh tê hesibandin. Biryareke neyînî dê bileztir te ji vî welatî jî derxin, adeten piştî 7 rojan ji dema biryardanê.

### DERKETINA JI WELATÎ

Eger biryara te ya dawiyê neyînî be, divê tu ji Fînlanda derkevî Eger bi dilxwazî vegerî welatê xwe, dikarî dawa alîkariya vegerê bikî. Eger bi dilxwazî venegerî, polîs dê te vegerîne welatê te. Berî ku te vegerînin, polîs dê piştrast bike ku li welatê te dê bi ewlehî te wergirin.

Eger polîs şikê jê bibin ku tu dê astengiyan li ber derxistina xwe çêkî, dikarin te mecbûr bikin ku hinek demên diyarkirî serdana polîsxaneyê yan navenda penaxwazan bikî. Polîs dikare biryarê bide ku te bigirin jêr çavdêriyê. Navenda çavdêrîkirinê girtî ye û mirov nikare jê derkeve. Zarokan pir kêm dikin navenda çavdêrîkirinê. Zarokên biçûktir ji 15 salan, ku dêbab ne li gel in, nabe ku qet bikin navenda çavdêrîkirinê.



## ITIRAZKIRINA LI BIRYARÊ

- Mafê te heye ku itirazê li biryara Daîreya Koçberan bikî li dadgeha îdarî. Li gel biryarê pêveka şîretên bo itirazkirinê jî heye. Di pêvekê de demek hatiye diyarkirin ku divê di wê demê de itiraz bikî. Bo nivîsîna itirazê tu nûner û parêzerê te dê bo te binivîsin.
- Dadgeha îdarî dikare biryarê qebûl bikin, biguherîne yan emir bike ku divê Daîreya Koçberan dîsa lêkolînê li ser meselê bike.
- Piştî biryara dadgeha îdarî dikarî ruxseta itirazkirinê ji dadgeha bilind ya îdarî bixwazî. Ew lêkolînê li ser hemû itirazan nake. Piştî hingê êdî nikarî itirazê li biryarê bikî, ew êdî biryara dawîn e.
- Bizane ku di dema itirazkirinê de êdî Daîreya Koçberan nikare agahiyan derbarê meşandina dawaya te bide. Tenê parêzerê te dikare agahiyan bide nûnerê te.

## MAFÊN TE

### Dikarî şîretan ji parêzerê xwe bikî.



Mafê te heye alîkariya dadnasî wergirî anku hevdîtinê li gel parêzerê xwe bikî hemû dema proseya penaxwaziyê. Nûnerê te dê bo te parêzerekî peyda bike û têkiliyê li gel wî deyne.

Karê parêzerê te ye ku di hemû meseleyên proseya penaberiyê de şîretan li te bike. Ew di mesleyên din de alîkariyê nake.

### Di hevdîtinên li gel karmendan de tercuman tê bikaranîn.



Tercuman bi zimanekî wisa diaxive ku tu fehm bikî. Ew belkî li wî cihî hazir bey an jî li ser telefonê yan bi rêya vîdyoyê be. Erkê tercumanan e ku suran diparêzin û ew bêalî ne.

### Agahiyan derbarê meseleya xwe werdigirî.



Mafê te heye wan belgenameyan bibînî ku derbarê te ne. Dikarî bi nivîskî ji Daîreya Koçberan bo nimûne wan belgeyan dawa bikî ku têkildarî biryar an lêpirsîna te ne. Agahiyên têkildarî dawaya te bi telefonê nayên dan.

### Dikarî kar bikî eger ji 15 salan mezintir bî.



Li Fînlanda nabe ku zarok kar bikin lê divê biçin xwandingehê. Eger bixwazî kar bikî, divê ku tu ji 15 salan mezintir bî.

Tu dikarî dest bi karkirinê bikî tenê çend mehan piştî dawakirina penaberiyê Agahiyên zêdetir derbarê karkirinê dikarî ji karmendên navenda penaxwazan yan ji malpera Daîreya Koçberan migri.fi wergirî.

### Dikarî vegerî welatê xwe.



Kengî bixwazî, dikarî dawaya xwe betal bikî û vegerî welatê xwe. Dikarî dawa alîkariya pareyî bo vegerê bikî.
Zêdetir ji karmendên navenda penaxwaziyê bipirse.

### Eger hewce be, dikarî dawayeke nû bikî.



Eger guherîneke giring di rewşa te de peyda bûbe piştî wergirtina biryara dawîn, dikarî dawayeke nû ya penaberiyê bikî. Behsa rewşa xwe ya guherî bike û sebebên xwe yên nû di cih de li gel dawaya nû bibêje. Eger te ti sebebên nû bo dawakirina penaberiyê tine bin, biryarek dê bêt dan ku lêkolînê li ser dawaya te nakin.

## ERKÊN TE

### Alîkariya ronkirina meseleya xwe bike.

Divê ku tu bo karmendan rast biaxivî û alîkariya ronkirina meseleyên têkildarî dawaya xwe bikî. Anku divê ku bo nimûne tu di lêpirsînê de hemû wan sebeban bibêjî ku çima dawa penaberiyê dikî. Eger te agahiyên şaş dabin, dikarin paşî îqameya te betal bikin.

### Dema meşandina dawa xwe li Fînlanda bimîne.

Nikarî ji Fînlanda derkevî berî ku biryar li ser dawa te bêt dan. Dawa te dê betal bibe anku êdî nayê meşandin

- eger du mehan hay ji te nemîne yan
- eger karbidest pê bihesin ku tu ji Fînlanda derketî.

### Were hevdîtinan.

Divê ku tu di hevdîtinên lihevkirî hazir bibî. Eger tu bêyî ti sebebek qebûlkirî di lêpirsîna xwe ya penaberiyê de hazir nebî, dikarin biryarê li ser dawaya te bidin bêyî lêpirsînê.

Eger tu nexweş bî, di cih de bibêje karmendê navenda penaxwaziyê. Wê paşî bigihîne Daîreya Koçberan.

### Hemû belgeyên têkildarî dawaya xwe bigihîne Daîreya Koçberan.

Eger te pasport, belgeya nasnameyê yan belgeyeke din hebe ku têkildarî dawaya te ye, wan bide nûnerê xwe daku ew bigihîne Daîreya Koçberan.

### Agahiyên xwe yên têkilîkirinê nû bike.

Agahiyên xwe yên têkilîkirinê yên nû bide navenda penaxwazan. Bersivê bide. Bibêje navenda penaxwazan eger hejmara telefona te yan navnîşana te yan parêzerê te biguhere.



## TIŞTÊN DIN YÊN GIRING

### Gerîna li dêbaban

Eger nizanî ka dêbabên te li kû ne yan nikarî têkiliyê li gel wan deynî, Daîreya Koçberan dê hewl bide ron bike ka ew li kû derê ne û têkiliyê li gel wan deyne. Bibêje nûnerê xwe eger te sebebek hebe ku naxwazî têkilî li gel dêbabên te deynin. Dikarî herwiha bi rêya Xaça Sor li dêbabên xwe bigerî. Zêdetir ji nûnerê xwe bipirse.



### Lêkolîna temenî

Giring e ku karbidest temen anku emrê te yê rast bizanin. Belkî te ti pasport an belgeyên din yên resmî tine bin ku temenê te jê bibînin. Di haletên wisa de piranî caran bi deqîqî temen tê ronkirin, bo nimûne bi lêkolîna temenî.

Lêkolîna temenî tê kirin tenê eger bi texmîna Daîreya Koçberan hewce be. Razîbûna te û nûnerê te bo lêkolînê tê ricakirin. Eger bêyî ti sebebekî qebûlkirî tu lêkolînê red bikî, hindê dê temenê te mezin bêt hesabkirin.

Lêkolîn demeke dirêj venakêşe û naêşîne. Di lêkolînê de doktor dê li gel biaxive û wêneyên rontgen anku îşaeyan ji didan û destên te bigire.

Şareza dê gotarekê derbarê temenê te bidin. Eger li gor lêkolînê tu jêrtemenî bî, tu tişt naguhere. Eger li lêkolînê temenê te cuda be ji wî temenê ku te gotiye, tu û nûnerê xwe dikarin reya xwe li ser meselê bibêjin. Eger piştî hingê biryarê bidin ku tu mezin î, ji hingê ve dê wek mezinan danûstandinê li gel te bikin. Tu dê neqil bibî navenda penaxwazên mezin. Karê nûnerê te jî diqede.



### LI SER KANALA YOTUBE YA DAÎREYA KOÇBERAN LI VÎDYOYÊN DERBARÊ DAWAKIRINA PENABERIYÊ BINÊRE

- Dawakirina penaberiyê li Fînlanda
- Ji ber çi sebebî îqame tê dan?
- Di proseya penaxwaziyê de kî çi dike?
- Alîkariya dadnasî di proseya penaxwaziyê de
- Lêpirsîna penaxwaziyê
- Bendewariya biryarê
- Biryara erênî
- Biryara neyînî

migri.fi/videot-turvapaikanhakijoille

Vîdyo bi van zimanan in: fînlandî, inglîzî, erebî, derî, farisî, rûsî, somalî, soranî, tirkî.



Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

TURVAPAIKKA-, MAAHANMUUTTO- JA KOTOUTTAMISRAHASTO

Euroopan unionin tuella

## AGAHIYÊN TÊKILÎKIRINÊ


**Daîreya Koçberan**
navnîşana posteyê: PL 10,
00086 Maahanmuuttovirasto
telefon: 0295 419 600
email: migri@migri.fi
migri.fi

**Nûnerê wekheviyê**
navnîşana posteyê: PL 24,
00023 Valtioneuvosto
telefon: 0295 666 817
email: yvv@oikeus.fi
www.syrjinta.fi

**Nêzîktirîn nivîsgeha nûnerê bilind yê Neteweyên Yekbûyî bo karûbarên penaberan, UNHCR**
navnîşan: Wenner-Gren Center,
Sveavägen 166,
11346 Stockholm, Swêd
telefon: +46 10 10 12 800
email: swest@unhcr.org
www.unhcr.org


migri.fi